Mewlana/Melayê Cizîrî û Dîwana wî ya hunerşah beş -2-

Ji nivîsîna: Emîn Narozî

Felsefe û Tesewifa Cizîrî
Melayî giringiyeke pir daye tesewif û felsefê û gelek ramanên xwe yên afirandina gerdûn û mirovahiyê yên ser cûreyên evînê û awayên jiyana civakî bi nêrîneke felsefî û tesewwifî diyar kiriye û di gelek cihên dîwana xwe de pirê caran jî bê navdan cih daye dîtinên mitesewif û fîlozofên din jî û ew destnîşan kirine:

Feyza ´ulûmê felsefe pir kifş e lê sitr û xef e
Min dî di camek qerqef e fincan bi can min cur´e da

Di piyaleyeke meyê de dema min qulpek ji fincana wê bi ser canê xwe da kir hingê min dît ku çi xêr û bereketeke pir di ilmê felsefê de heye, lê ew veşartî ye û ji herkesî ve nexwiya ye.

Melayî di gelek cih û waran de xwestiye fîlozafiya cihanî ya mîna Arîsto, bi taybetî jî Eflatûn û ya îslamî mîna ya Ibnî Sîna, Farabî, Îbn Ruşd û Îbn Erebî ku yê dawî di gelek cihan de tesîr lê kiriye, bigihîne hev û dijîtiyên navbera wan ji holê rake

*Ez dibêm **´Îsa** ye ew ya **Bû Elî Sîna**ye ew*
Lew bi remz û ´işweyan pir mu´cîzat û şîwe ye

Bi ya min ew dildar ya weke Îsa (e. s) bi nîşan û dirûv û naziyên xwe yên weke mu´cîzatan miriyan sax dike yan jî mîna Ebû Elî Îbn Sînayî (Avicenna, 980-1037) bi şêweyên zanista tibbî (bizîşkî) dibe dermanê derdê dilan û jana wan baş dike û vedijîne.
Li vê derê ew ramanên îbn Sînayî ku yek ji şareza û rêşînasê mezintirîn yê felsefê bûye û di gelek waran de ramanên fîlozofên rojava, bi taybetî jî yên yûnanî ku berê bi saya wergerên bo erebî yên Huneyn ibn Îshaqî û kurê wî Ishaq îbn Huneynî (nêzî 870-910) gihabûn nav cihana islamê, berfirehtir û bi awayekî sistematîk bi rêkûpêktir kiribû, destnîşan dike.

Herweha Ibn Ruşd/Averroes (1126-1198) jî filozofekî islamê yê navdar e ku li ser ramanên Aristo (384-322 b. Isa) û berhemên wî xebitiye, ew rave kirine û berfireh û bi rêkûpêktir kirine û gihandine alema islamê û ya rojava.

Nêrîna Cizîrî li Hellacê Mensûr û Sirrên Tesewifê
Mela rewşa wehdet ul-wicûdê û rêbaza Hellacî weha rave dike:

Ji ene l-heq bi lebên le´l-i xeberdarî bûyîn
*Bi gulaba serê zulfa xwe te **Mensûr**-i kirîn*

Dema em bi wan gotinên te yên xweş yên şêrîn ji naveroka “en el-Heq” agahdar bûn hingê bi wî toqê serê biskê xwe te em kirin mîna Hellacê Mensûr ku me jî fena wî dest bi şetatî û petatiyan kir. Li vê derê jî Mela dîtin û ramanên Hellacî pîroz didêrîne û gotina wî ya “en el-Heq” jî ji ber ku di halê gihîştina radeya tesewifê ya wehdet el-wicûdê de gotiye rast dibîne, lê herweha ji ber ku ev derbirîn li gor wî bûye sedemê diyarkirina razeke nihênî ya tesewifê, encamdana wê ya bi sezakirina Hellacê Mensûr jî xwezayî û maqûl didêrîne.
Mela rewşa wehdet ul-wicûdê û rêbaza Hellacî weha rave dike:

Remzek nihîn avêhte dil mihrê ji batin mêhte dil
Şehzadeyê sur rêhte dil şehkaseya ferfûr e dil

Hostayê ´işqê dil hevot ser ta qedem hingî disot
Remza “ena `l-Heq” her digot bawer bikin ***Mensûr*** *e dil*

Dilketiyê bi nihênî îşaretek avête dil ku bû evîneke bi şewat û ji hundir ve li dil mijiya ta kucezbê rête wî dilê weke piyaleya ferfûrî.
Gava dil bi hevîrê evînê ji hêla ustadê evînê ve hat sitran û qenc hat hevotin hingê kelekê lê da û şewatekê ew girt ku êdî hişê xwe winda kir û weke ku hebûna wî ji holê rabûbe xwe nedît û di nav xeyala Xwedê de winda bû û bêhemdê xwe weke Hellacê Mensûr ji devê wî jî şetatî û petatiya “ez Xwedê me” derket ku ev jî jê re bû nîşana gihîştina radeya wehdet el-wicûdê.

Di vê malikê û ya pêşiya wê de Mela dide zanîn ku Hellacê Mensûr ji ber agir û kelewahca evîna xwedayî gihaye radeya wehdet el-wicûdê, bi Xwedê re bûye yek û xwe di zatê Wî de dîtiye ta ku van gotinên “en el-Heq, En el-Lah” û yên din gotiye û tê de serê xwe jî daye. Vêca çendî ku li gor zanîna berbiçav û şerî´eta zahirî ew ji bo van gotinan hatiye sezakirin jî lê wî ne vala weha gotiye, ew gihîştiye radeya “*fena fî l-Lahiyê*” ku loma weha ji pesnan xeberdaye. Nexwe sedemê sezakirina wî belavkirina sirrê tesewwifê bûye ku diviya wî xwe ragirta û wan sirr û razên wê payedariya berz belav nekira.
Herweha ew bi risteyên:

Xizmeta pîrê muxan dê kit kesê meqsûd e mey
Şîşe û cama zucacî ê divêt dê ret Heleb

Cewrê Hindî dê kişînit her kesê tawis divêt
Cewher û durra yetîm bê terk-i ser têtin teleb

jî belkî Suhrewerdî Eb ul-Feth Şehabeddîn Yehyayê kurd (549-587/1154-1191) û çûna wî ya Helebê û kuştina wî li wê derê bi fetwaya komek zanayên serdema Selaheddînê Eyyûbî (1138-1193) yên xwedî desthilat destnîşan dike ku serpêhatiya wî jî ne kêmî ya Hellac e.

Yanî:
Çi kesê ku amanca wî şerab be dê ji pîrê meyxaneyê re xizmet bike, lê yê ku piyale û îstekana camîn bivê û ji bo wan bi dest bixe bila here heya Helebê cem desthilatdarên mezin yên comerd û hingê jî dê ji ber daxizî û zikreşiya di riya evînê de û ji ber gotin û nêrînên cuda yên nû di halê *fena fî l-Lahiyê* de bi giliyê çavnebar û heqîqetnenasan bê sezakirin. Ji xwe her kesê ku bixwaze bigihê "teyrê tawis" û wî bibîne jî dê tadeyiya yê hindî bikêşe, lewra bê dana serî yan jî bê terkeseriya ji welatê xwe kes nagihîje gewher û mirariyên bêhempa. Dibe ku Cizîrî bi vê risteyê çûna cem sadatên neqşebendî yên Hindê yên serdema xwe destnîşan kiribe ku Îmam er-Rebbanî es-Serhindî (Ehrarî-Neqşî 1564-1624) yê hevdemê wî jî hingê li wê derê bûye.

Me bi ***işraqî*** *sualek ji lebê xunçekuşa kir*
Go bi ilhamê dizanî di suala me cewab e

Bi awayê rêbaza fîlozofên îşraqî min di dilê xwe de bê ku ez biaxivim ji dildarê xwest ku bi lêvên xwe yên gulbişkoj pirsa renckêşiya me ya ji ber êş û belayên vê evînê bike. Wê jî bê ku bi wan lêvên weke pijkoja gulê biaxive, bi rêya sirûş û îlhama îşraqiyan bersiv da û got: "Tu dizanî ku bersiva pirsa me ji pirsê bi xwe tê zanîn û ji ber wê jî tu pêwîstî bi pirsa rewşa te nîne".

Yan jî wê bi pirsê bersiva me da û "*Go* (*ma*) *tu bi ilhamê dizanî*?"Yanî ger tu bi ilhamê zanibî û gihabî radeya têgihîştina sirûşî hingê pêwîstiya axaftin û xeberdanê nake.
Mela di van herdu risteyan û yên raser de dide zanîn ku Şêx Şehabeddîn Suhrewerdî ji ber nêrîna xwe ya îşraqî li Helebê bi fetwaya zanayên zahirî ku heqîqetnenas in û bi fesadî û zikreşiya wan û israra li ser Selaheddînê Eyyûbî ji bo derxistina fituya kuştina wî, hatiye kuştin û li gor wî mîna Hellacê Mensûr neheqî pê re bûye, lê sedemê vê jî dîsa derxistina wî ya razên heqîqetê ye.

Weke ku me berê jî got Cizîrî bi dilekî xurt û aspekteke fireh li gelek raman û nêrînên fîlozofî nihêrtiye, giringî daye pirên wan û ew hêjayî destnîşankirin û ravekrinê dîtine. Mîna van risteyên jêrîn ku tê de hem dîtina fîlozofên mu´teziliyan dest nîşan dike, ku dibêjin: "Her kes kirdeyê/fa´ilê kirina/fi´la xwe ye, ger na nexwe ev çi xêr û guneh û seza û padaş e." Yanî ger her tişt bi Xwedê be nexwe perestina Wî bes e êdî qeyd û benda kufr û îmanê/bibawerî û bêbaweriyê çi ye û çima heye?[7] Hem jî mîna Shakespearê hevdemê xwe bi van risteyên jêrîn nêrîn û teoriya Eflatûn ya "Bûn û nebûn"ê (To bee or not to bee: Bûd û nabûd) destnîşan kiriye.

Herdu birhên te ne mîhrab çi ***îman*** *û çi* ***kufur***
Bûd *û* ***nabûd*** *ku yek in ev çi* ***sewab*** *û çi ´****îqab***

Çi bawerî hebe û çi jî tunebe mihrab û berîgeha (qîbleya) perestinê her tu

yî û birûyên te ne, vêca ger hebûn û tinebûna baweriyê mîna hev be, nexwe ev çi padaş û çi seza ye.

Lê digel destnîşankirin û ravekirina dîtin û ramanên van fîlozofan giş jî dîsa Cizîrî di honraweya xwe ya dirêj ya li ser gerdûn û awayê afirandina wê de gava rewşê bi berfirehî rave dike, dibîne ku bi rastî ew gelekî tevlihev e û têgihîştina wê bi awayekî yekser û konkret ji her kesî re ne hêsa ye, heta pir zehmet e jî ku loma dixwaze vê yekê diyar bike û dibêje:

Min dil ji fehmê qasir e ji wî sûretê çar ba gire
Pê kir temam ew dayire neqşek ji wê terwende da

Bêguman dil û hişê min ji têgihîştina vî karî re kêm dimîne û têr nake, çunkî di vî wêneyî de gelek pirsên bi hişkegirêk hene ku mirov nagihê koka wan, lê tiştê diyar ew e ku Kirdigarî hino hino çembera çerxê temam kiriye û her roj nexşeke nû mîna mêweyê terwende jê afirandiye.

Yek jê ji teqwîma qedîm lê bû neseq hukmê Hekîm
Avête wê lewhê reqîm têk ´alemê pê şu´le da

Xwedayê dadres yek ji wan nexş û nîgarên nû ku di bîrewerî û têgihîştina kevnare de hebû bi rêkûpêk ew rêz kir, penda perwerdigarî tê de bi cih û rast kir û ew avêt lewheya ku nivîs û hejmar li ser hebûn ta ku gerdûn hemî bi wan nexşan rohnî û geş bû û şewq veda.

Hingî ku xett û nuqte ne ewda´ û eşkal tê hene
Her yek bi miqdarê xwe ne esla tesewwur rê neda

Bêguman ji ber piraniya xet û xalên di wê lewheya nivîsî de û hebûna rewş, awa, şêl û şeklên cihê yên tê de, digel tibabeke din ku ew jî ne kêm ne zêde bi qasî heryek ji wan bi xwe ne, ew bi rastî dûrî raman û bîrbirinê ye û bê sirûşa xwedayî kes neşê tê bigihê.

Miqdar û şiklê hendsî kêm zêde yek pê nahesî
Teswîr dikir Iqlîdesî hetta bi sethê sufle da

Ew tibab û miqdarê wan şekl û rewş û şêlên wan xêz û xalên endaziyarî kes zêde pê nahise û pê nizane, lewra yê ku pê dizane û ji çerxa jorî heya rûyê xwarî yê vê erdê pîva ye û şekil dayê Iqlîdes (Euklîdes283-306ê berî Îsa) e, hew ew pê dizane.

Mersef di nav van meş´elan qet´a mesafa merhelan
Sirra birûc û menzilan resma sulûkê cadde da

Rêzbendî û cadeya navbera van meşaleyên stêrên çerxa felekê û birrîna wan ya qonaxên dûriyê di wê gerra xwe de digel razên birc û qonaxên esmanî di vê çerxa gerok ya fireh de wêneyê çûyîn û rêwîtiyeke bedew û gereke ecêb ya bêhempa da.

Bi vê re jî Mewlana Cizîrî divê bide zanîn ku zanîneke yekalî û sade heya ya metafizîkî bi tena serê xwe jî têra têgihîştina awayê afirandin yan jî hebûna siruşt û gerdûnê hemî nake, lê digel zanîn û şarezahiya fîlozofî divê ya matematik, astronomî, fizîk û kîmyaya xurt jî hebe ta ku karibe qanûnên ger û pêç û deweran û fetlên xweza û gerdûnê fêm bike û wan ji hev derîne/derxe.

Herweha ji bilî vanên jorîn Mela gelek fîlozofên mîna Empedokles (berî Îsa 490-430), Aristoteles (384-322 b. Isa), Eflatûn/Platon (427-347 b. Îsa), Sokrates (470-390 b. Îsa) û mutesewifên mîna Marûfê Kerxî (m+ 200/815), Şiblî Ebû Dulef (m. 946 p. Isa), Ibn Seb`în (1197-1270), Ibn ´Erebî (1165-1240), digel sofî û şairên mîna Se´dî (580-691/1183-1291) û Hafizê Şîrazî (1320-1388-90), Camî (1414-1492), Ferrûxî (m. 1038), Rûmî (1207-1273) û Şemsê Tebrîzî (1185-1247) jî di cihên cuda yên Dîwana xwe de destnîşan kirine û bi dana navên wan hem ramanên wan yên felsefî û rewanbêjî raxistine ber çavan û hem jî carina bi kurtî ew rave kirine. Çawa ji vê yekê jî baş dixwiyê ku Cizîrî hem muteswif û fîlozofekî rewşenbîr yê serwext û hem jî rewanbêj û suxenwerekî çalak yê hêja yê honrawe, wêje û edebiyatê bûye.

Rewşa civakî, siyasî û dîrokî di Dîwana Cizîrî de
Gava mirov bala xwe dide rewşa kurdistanê ya 300-350 salê berî Cizîrî heta hê berêtir jî dibîne ku gelek bobelatên mezin bi ser kurdan ve hatine ku mezintirînên wan jî êrîşa Cengizxan (1162?-1227) û neviyê wî Hulagoyê (1217-1865) hîmdarê dewleta ilxaniyan bû. Piştî wî jî dewleta ilxaniyan di navbera du serekên ilxaniyên moxulî de hat parvekirin: Seldoz û Celayir (738/1336-7) û pê re jî welatê kurdan bû dû beş, lê demek piştre bobelateke nekêmî herduyên jorî ya Tîmûrlengê (1336-1405) zordar û sitemkar bi ser wan ve hat ku bi rastî van hersê çar desthilatdariyan gelek kuştin, xwînrêjî, talankarî û wêrankariyên mezin li Kurdistanê kir. Dû re piştî Tîmûrlengî jî ji ber şer û cengên desthilatadariyê yên di navbera moxilên celayirî û tirkmanên Kara koyunlu (1375-1468) û Ak koyunlu (1378-1508) de di welatê kurdan de wêrankarî û talankarî kêm nebû û her bi wê sitemkariyê domand û ziyaneke mezin da kurdan û welatê wan.

Îca hê ew tam ji ser kurdan ranebûbû ku vê carê jî zilm û zora sefewiyan bi ser herêmên kurdan ve girt û gelek navendên weke Cizîra Botan, Diyarbekir, Mêrdîn, Hesenkeyf û yên din ketin bin dagîrkeriya şah Îsmaîlê esil kurd, lê çendî ku kurd bû jî ji bo nêrîna xwe ya mezhebî bi riya raspêrên xwe yên şî´î pir tade û zordarî li kurdan kir ta ku kurd bêgav bûn û bi riya Îdrîsê Bedlîsî peyman bi Yawiz Siltan Selîmê Osmanî re çêkir û bi alîkariya wan û serkeftina cenga Çaldêranê (1514-1517) sefewiyan ji hinek welatê xwe derxist û zilma ser xwe kêm kir. Piştî vê jî aştiya ku di navbera dewleta Osmanî û ya Sefewîyan de di sala 1542yê de pêk hat bi gelemperî navçe û bi taybetî jî Kurdistan hinekî ser rihet bû û aramiyeke kurt hat herêmê.

Lê hê di sala 1553yê de êrîşên kuştin û wêrankiriyê yên Şah Tahmasbê

Sefewî dest pê kirin û heya sala 1589ê bi bûyerên cuda domandin ta ku hingê di navbera herdu hêlan de lihevhatinek pêk hat û heya sala 1603yê domand. Bes dû re ji hêla osmaniyan ve aştî hat xerakirin û wêrankarî û talankariyên Şah Ebbasê Sefewî li Kurdistanê dîsa dest pê kirin ta ku demek piştre di sala 1639ê de bi peymana Qesra Şêrîn Kurdistan di navbera herdu desthilatan de bi tamamî hat parvekirin.

Vêca çi ev texrîbkarî û wêrankariyên berî serdema Cizîrî bin ku divê wî ew hem di kitêbên tarîxê de xwendibe û hem jî ji serpêhatiyên kurdan yên devikî bihîstibe û çi jî ji yên ku di dema wî de qewimî bin û wî bi çavên xwe ew dîtibin, bi wan re mezin bûbe û jiya be, bêguman divê van hemiyan bandoreke pir li ser kiribe, bi wan zahf êşiya be û renc û azareke dijwar ji ber wan kêşabe heya ku di gelek beşên honraweyên xwe de di gel şewata derdê evînê û pêwendiyên perwerî yên fîlozofî û tesewifî wî ev kul û keser, êş û jan û kovan û xemên xwe jî gotine û derbirîne.

Jixwe ustadekî Weke Cizîrî ku yek ji zanatirîn û rewşenbîrtirînê serdema xwe bûye ne mimkin e ku ev wêrankarî û talankariyên kambax bala wî nakişandibin û wî ew di ser guhê xwe re avêtibin, li ser ranewestiyabe û di honraweyên xwe de cih nedabe wan û ji wan re bêdeng mabe.

Na ne mimkin e, bêguman ew li ser wan rawestiyaye û di van risteyên xwe yên jêrîn û gelekî din de eşkere ew bi nav û adres destnîşan kirine, çendî ku di hinek cihan de wî bisk, gulang, kezî, birû, çav û bijangên dildara xwe bi wan şibandibe jî lê amanca wî ya sereke bi wê mînandinê jî dîsa diyarkirina zordarî, kotekî û sitemkariya wan e.
Hinek ji wan risteyên wî ev in:

Ji re´na nêrgizên tey mest û xwînrîz
Zeman bû ´ehdê cengengîzê ***Cengîz***

Ji ber rindî û xweşengiya çavên te yên nêrgizî û awirên wan yên tûj ku xwîna evîndaran dirêjin, dem bû weke serdema êrîş û cenga Cengiz Xan ya ser welat û mirovan ku cihanê kiribû gola xwînê.

Sef sef mi dîn ***Hindî*** *û* ***ZengCengîz****-i hat* ***Teymûrê Leng***
Xef wan reşandin dil xedeng teşbîhê tîrên Xan Şeref

Min Leşkerê hindî û zenciyan[8] sef bi sef rêzbûyî dît ku dihatin me û herweha zordar û sitemkarên mîna Cengizxan û Tîmrûleng jî bi sipahên xwe ve hatin me û hemiyan bi dizî tîr avêtin dilê me ku tîrên wan jî mîna yên Mîr Şeref Xan dijwar bûn.

Rûm *û* ***Ecem*** *ji her teref ceng û suwaş e wan bi xef*
Hindî *û* ***Zengî*** *sef bi sef hatine ber liwayê zulf*

Sipah û leşkerê Rûm û Ecem ji her hêlê ve bi dizî bi hev re ceng dikin û sipahên hindî û zenciyan jî hatine li ber alaya zulfan rêz bûne û sef girtine.

*Geh dil û geh can dibin **tirkên** te tên*
Nakirin yexma û talanê xelet

Ey dildar hember û gelacên ku di fizûliya/fesadiya xwe de mîna tirkan dilreq û xwînrêj in, ne bi şaşî lê bi zanîn geh tên êrîşî dilê me dikin û geh jî canê me talan, axme û telef dikin.

*Meşrebê **tirkan** Firat û Nîl-i kir*
Teşneleb çû terfê ´ummanê xelet

Dildarê, berê tirkên sîtemkar yên dilreq û fitnebaz da ser ava şêrîn ya tamxweş ya çemê Firat û Nîlê, lê evîndarê tîyê lêvziwa û lewazê ji ber germa evînê li hev şaş kir û berê wî da deryayê ta ku bi ava wê ya şor û tahl tîbûn û kelewaca wî zêde bû û bêhtir lêvçikçikî ma.

***Turkê** xwînrîz û xumarî me bi yek xemzeyekê*
Zuhdê çilsale li min zêr û zeber kir ji esas

Ew dildara me ya weke tirkên xeddar yên xwînrêj û sergêj yên serxweş bi yek awireke çavên xwe yên sêrbaz û dilrakêş terkecihanî û perestina me ya çil salî serobono û bermeqlûb kir.

*Tu binê **Rûm** û ´**Ecem** kuştine zengî di kemîn*
Hane her tête peyapey ji teref Rûm xweş û xweş

Ey dost tu li sipahên Rom û Faris binêre bê çawa êrîşî zenciyan kirine û ew di şargeh û stara wan de kuştine û ji vî leşkerî re ha ha ye ji hêla Romê ve li pey hev û bi lez hê hawar jî tê.

***Rom** û '**Ecemî** girtiye oxilme bi sef sef*
*Cohtê **muxulan** hatine cengê hebeşî*

Leşkerê Rom û Ecem di qada cengê de li ber hev pahn û rêz bûne xwe ji hev re digurgirînin û fêrisên moxulî jî hatine şerê hebeşiyan û cote cot êrîşî wan dikin.

Tox û ala ku xwiya bûn ji ´**Ecem**
Ereban tîp-i şikestin çep û rast

Çi dema direfşên **moxulî** û alayên **faris** yên **Ecem** ji aliyê rojhilat ve derketin û êrîş anîn ser leşekrên **ereban** hingê ew bi yek derbekê şikestin û rast û çep bi lez û bez reviyan.

Bikaranîna hunera bedî´/bedewî û rewaniyê:
Ustad Mewlana Cizîrî jî mîna gelek şairên serdema xwe di honraweyên xwe de gelek qaîdeyên suxenwerî û rewanbêjiyê ku wêjeyê/edebiyatê bedew didêrîne û payebilind dike bi hostatî bi kar aniye:

Mîna bikaranîna gelek gotinên hevmane û yên sec´î (سجعي) ku paşiya hevok û gotinan lihevhatî ne:

Lew weku sewda û ***dîn im*** *herdema dêmê* ***dibînim***
Dîn dibim heyran ***dimînim*** *Muşterî ya* ***Zuhre ye***

Sedemê ku ez weke evîndarê sewsî û dînê sewdaser im ew e ku çi gava ez rûyê dildarê dibînim û çavê min bi çehreya wê dikeve ez dîn dibim, heyran dimînim û nizanim çawa bi hişê xwe ve bêm, çi bibêjim û tiştên ku dibînim jî ji hev venaqetînim. Ez nizanim gelo ew tiştê ku ez dibînim rûyê dildarê yê rohnî ye yan jî çehreya wê ya geş e, yan jî rojgara Bercîs a bi şewq e, yan jî stêra Gelavêj ya bi rohniya rengmirarî ye.

Şems di nêv burca şeref ***da*** *sed kewakib çar teref* ***da***
Muşterî hatî bi ref ***da*** *istiwa çû* ***qible ye***

Min rûyê dildarê di nîvê birca şerefê ya bilind de dît ku li dor herçar hêlên wê jî bi sedan xişrên mîna stêrên pertewdayî diçirisîn. Herweha guharê guhê wî jî di gel refên xişrên wê dibiriqî û xeta rûyê wê jî ku digiha heya nîvê esmanan, bûbû qibleya temaşevanan û Kabeya evîndaran.

Teşbîh/mînandin:
Leylet ul-Qedr *û* ***Berat*** *in* ***zulf*** *û* ***cebhet*** *subhê* ***´îd***
Dêm *weku fesla* ***biharê*** *lê* ***qiyametqedd*** *û* ***qam***

Biskên dildarê weke şeva Qedrê û ya Bera`etê reş î pîroz û bi rûmet in, eniya wê jî mîna roja cejnê bi rewşen û diçirise û rû jî fena demsala biharê bi gul û çîçekan şên e, lê bejna wê jî weke roja qiyametê tije ye ku mirov nikare berê xwe bidê û lê binêre.
Li vê derê di navbera zilf û şevên Qedr û Bera`etê de, di navbera enî û serê sibeha îdê gava tav diavêje de, di navbera dêm û gul û çîçekên biharê de û di navbera bejn û roja Qiyametê de teşbîheke rewanbêjî heye.

Qewsê *du* ***hilalan*** *ku li ser* ***bircê esed*** *bit*
Bû şuhre di ´amê ´emel enguştê numa girt

Çi dema ew kevanên wek hîva yekşevî ku birû ne, hatin raserî birca şêr ku çav in, nav û dengê wan di nav xelkê de belavbû û bi tiliya hatin nîşandan. Li vê derê di navbera birûyên dildarê û heyva nûavêtî ku cara pêşî li esmanan xwiya dibe, de teşbîh heye.

Mecaz, kinaye û isti´are(idyom):
Bîzê dikit ji qencan ji remz û naz û xencan
Qedrê ***gulan*** *çi zanit* ***kerbeş*** *divêt* ***kerêreş***

Ew bêcanê dilhişk ji bedewên spehî û nîşan û nazên wan bîzê dike û ji wan direve, îcar dê çawa qîmeta gulên bihnxweş zanibe, çunkî ew ker e û ker jî hew ji giya û qîvarê kerbeşê hez dike. Îdyoma "**Qedrê gulê çi zane**

kerbeş divê kerê reş” tê nîşandan, yanî merivê nezan qîmeta tiştê baş nizane.

Belku dîwar-i bi guh bin bi Xwedê kî bi Xwedê
Bi tu rengî nekirî eşkere esrarê hudûs

Tu bi Xwedê kî, tu bi tu reng û tu awayî raz û nihêniyên çêbûna gerdûnê eşkere mekî, lewra dibe ku dîwar bi guh bin, wan bibihîzin û wan belav bikin.
Li vê derê idyoma "**Hêdî bêje dibe ku dîwar bi guh bin, bila nebihîzin**" destnîşan dike, yanî gotinên girîng li her derî mebêje!

*Nesîmê **sinbul** û **sêvan** seher da hebs û zindanê*
Vebû qufla me bê mifte ziringînî ji quflê da

Dema bayê nesîm yê qencî û dilovaniyê ji ber gulang û dêmên dildarê di berbangê de li me evîndarên dilmîna zindan da, hingê qefla derêwî dilê reng zindan bê mifte vebû, zingînî jê çû û dengê wê giha her derî.
Li vê derê Cizîrî hunerê **isti´arê** kiriye ku sinbul û sêv bi gulang û dêmê û dil jî bi zindanê şibandiye.

Cînas/tecnîs (gotinên hevherf û manecuda): vêca ger herdu gotinên hevherf û manecuda di hejmar, rêz, awa û cureyên herfên xwe de weke hev bin, ew dibe cînasa tam û ger di yek ji van de ji hev cuda bin hingê dibe cînasa kêm[9]:

__´Izarê__ger li min dî tu li dil de
"Li enn el-qelbe qed yehwa __´izarek__"

Ey dildar ger ji ber ku min ji heddê xwe zêde kiriye û dil berdaye ne hinkûfan tu bivêyî serê **sertîrî** li min bidî, fermo li dil de çunkî ew e sûcdar û gunehkar ku ji **gulangên** ser rûyê te hez dike û dil berdaye wan.

Ji xwe cînasa tam ya navbera herdu ´îzaran diyar e ku mebest ji **´izara**pêşî sertîr e û ji **´izara**dawî jî bisk û gulang in.[10]

*Vê firqetê pir dil **şewand** cerhên qedîm dîsa **kewand***
*Şîşên di sor tê da **tewand** feryad ji destê firqetê*

Vê cudahiyê dilê me pir şewitand û peritand û birênên kevn jî ji nû ve kewandin û şîşên sorkirî jitê de birin û anîn ta ku ew tewandin, ax ji destê vê cudahiya dilşewêt û rencdêr.
Di vê derê de jî hunerê cînasa kêm heye ji ber ku "**wand**"a peyvên: **şewand**, **kewand** û **tewand**ê yeke lê peyv giş na.

Telmîh/bibîranîn(bi gotin yan jî hevokeke kurt destnîşankirina bûyereke dîrokî yan jî serpêhatiyeke navdar):

"*Minnet ji tali' her ji bext Asif bi text û bext û rext*
Belqîs ewî anî bi wext îro Suleyman î Mela"

Ez ji vî bext û şensê xwe yê xweş yê baş re gelek minnetdar û spaskar im ku mîna Asif ibn Berxiyayê hêzdar û bi şiyan ji min re dildara fena Belqîsaya şahbûnaya welatê Sebe´ê mezin û peyebilind di cih de di gel text, bext, cilûberg û pertalên malê pêk ve anî û ez mîna Silêmanî (e. s.) şa kirim.
Li vê derê jî Cizîrî bûyera Silêman (e. s.) û Belqîzayê ya "Qal el-lezîne --" t. d.diyar dike.[11]
Dîsa bi risteyên:

"*Şukur bînahiya min hat û Yaqûb dîde rewşen bû*
Bi boya Yûsufê Misrî li Ken'anê beser peyda"

Şikir ji Xwedê re ku ew dildara weke rohniya çavên min hat û pê re jî bînahiyên min zivirîn, çawa ku bi hatina bihna qutikê Yûsufê Misrî jî rohniya çavên Yaqûbê Ken'anî lê vegeriya bû. Li vê derê jî bûyera Yûsuf (e. s.) ku bi anîna kirasê wî rohniya çavê bavê wî Yaqûb (e. s.) lê vegeriya bû, destnîşan dike.
Herweha dîsa bi risteyên:

"*Ger ji wê horîsiriştê ´îşweyek izhar-i bit*
Dê bibit narê Xelîl il-Lah û dojeh sar-i bit"

Eger yek libteke narîn û nazenînî ji wê dildarê çêbibe û here ser wî dilê mîna agirê dojehê dê ew agir weke dêza agirê ku Nemrûd, Îbarahîm (e. s) avêtibû nav, sarbibe û bibe ewlehî.
Mela bûyera ku Nemrûdî Îbrahîm Pêxember (e. s.) avêtibû agir, destnîşan dike.

Tewriye (rexneya sergirtî, poşîna rastiyê): Ger gotin, hevok yan jî risteyeke ku du mane û zêdetir maneyan bide û ji dêla ya nêzîk ve ji bo sergirtin û poşandinê maneya dûr bê amanc kirin ew tewriye ye:

"***Ayetê** husnê **mufessel** ke ji **keşşafê** cemal*
*´Ilmê ´işqê bike **tefsîr** û ji defter meke behs*"

Tu nîşan û dirûvên spehîtiyê li gor raveya cemal û şepaliyê ya ayeta "*Xwedê rohniya erd û esmanan e*" qenc şirove bike da tu li gor wê, tefsîra zanîna evînê bikî û behsa kitêb û defterên din mekî.
Di van risteyan de hem nazikî û rewanbêjiya bedew ya bikaranîna gotinên nêzîk yên "**ayet**, **mufessel**, **keşşaf**" û "**tefsîr**"ê heye û hem jî tewriye heye ger ku ji "**Mufessel**" û "**Keşşaf**"ê navên kitêban[12] bên girtin ku maneyan wan ya dûr e.

Mubalexe/zêdekirin (pesindan û danenasîna zêde):

"*We`r ji ber perdê yedê beyda bi mu´ciz bête der*
Şems û kewkeb dê hilên ´alem tejî enwar-i bit"

Ger bi rêya mu´cîzeyekê destên spî ji ber perdê bêne der, hingê dê roj û rojgar hemî hilên û cihan giş rohnî bibe.
Di hilatina rojê û stêran ji ber destê spî û rohniya cîhanê de zêdekirineke rewanbêjî heye.

Tecrîd/ (ku xwe têxe ciyê yekî din û bi xwe re biaxive):

"*Leşkerê ´alem meger yekser te dijmin bin **Mela***
Xem bi mûyek nakişînî ger te dilber yar-i bit"

Ey "Mela" ger ku dildara te bi te re dost û yar be leşkerê temamê cihanê neyarê te be jî dîsa bi qasî yek mûyekî jî xem nake û tu çu minet ji wan hilnayinî.
Di vir de Cizîrî bi gotina "**Mela**" ku xwe dixe ciyê yekî din û pê re diaxife, hunerê tecrîdê yê rewanbêjiya bêhempa (bedî´ê) dike.

Alliterasiyon/ (dubarekirina deng û ahengkirina gotinan):

"*Şox û **şengê**zuhre**rengê** dil ji min bir dil ji min*
*Awirên heybet**pilengê**dil ji min bir dil ji min*"

Ew xezala narîn û dildara ku rohniya rûyê wê weke gelavêjê tîrêj dide bi dilê min girt û revand, herweha awirên çavên dildarê yên tûj ku bizd û xofa wan mîna ye tirs û bizda pilingî dilê min talan kir û bir

Telmi´ /du-sê-zimanî (Nivîsîna riste yan jî malikan bi çend zimanan):

Di iqlîmê suxen mîr im di şi'rê de cehangîr im
"We ye'lu mewkib el-'uşşaqi e'lamî we rayatî"

Bêguman ez mîrê welatê xweşbêjan û yê herêma rewanbêj û xweşaxêvan im û di pîşeyê honraweyî û honana helbest û qesîdeyan de cihangîrê şair, xwedî dîwan û nivîskaran im û gava karwanê koma evîndaran here hizûra pîroz ya bexşandinê û civata nêzî gihîştina cem, hingê alaya min bi ser ya wan dikeve û bandrola min jî li pêşiya karwanê wan bilind dibe. Çunkî serdarê pêşeng û mîrê mezin ez im

Faxriye/pêpesnîn/bixwepesinîn:

Di î´cazê beyanê da suxen ger bête insafê
Dizanit muxteser herkes Melê sihr e `îbaret kir

Di biwara diyarkirina mu´cîzatan yanî tiştên ji her hêzê der de gava bi wijdan bê axavtin hingê hemî kes bi kurtî dizane ku hevok û gotinên Melê fena efsûn in.

Medhiye/pesindan:

Xanê xanan lami'ê necma te her pirnûr-i bî
Keştiya bextê te ez bayê muxalif dûr-i bî

Ey mîrê mîran ez ji Xwedê hêvî û lava dikim ku stêra te ya tîrêjavêj herdem pirgeş be, yanî hertim bextxweş bî û herweha ez hêvîdar im ku gemiya bextê te jî ji bayê dijberê gemiya te dûr be da ji rêya xwe nemîne.

Ji bilî van jî ustadê gewre Mewlana Cizîrî gelek hunerên bedewdêriya rewanbêjiyê yên din jî mîna **tibaq û tezad**, **tenasub**, **ne´t**, **terci´ê bend**, **texmîs** û **terdiye** û yên din bi kar aniye, lê ji ber dirêjiyê me ew hiştin ji lêkolîneke berfirehtir re.

---

[7]Bnr. Se´deddîn Teftezanî (m. 791), Şerh ul-´Eqaid/Kestelî, Salih Bilici Kitabevi Yayınları, 1966, Stanbol, r. 109-112.

[8]Bi ya min mebest jê xanedanên ku di dema medan de ji hêla Hindê ve hatine, mîna Persan û yên din û ereb, nûbî yan jî misriyên ku hatine cenga pêşiyên kurdan in.

[9]Ji bo berfirehî bnr. I. A. c. 3, 193, xala cînasê; A. Baki Turan, b. n. r. 101-102.

[10]Bnr. Zivingî, Iqd el-Cewherî fî Şerhi Dîwanî Şeyx el-Cezerî, qesîde 60, ya bi beşawenda "K"yê

[11]Bnr. sûretê Nemil (27), ayet 4.

[12]Ev navên du kitêbên navdar yên ´Ellame Eb ul-Qasim Mehmûd ibn ´Umer ez-Zemexşerî (467-538/1074-1143) ne, **Keşaf** tefsîra Qur`anê ye û **Mufessel** jî ya nehwê (rêziman) ye. Ew li Zemexşera Xwarzemê hatiye dinê, di dema lêgerîna xwendin û zanînê de çûye heya Bexdayê û ji wê derê jî çûye Heccê, li wê derê maye û bûye cînarê Kabê ta ku tefsîra xwe temam kiriye. Ew mezinekî mu´teziliyan bûye û di rewanbêjiya erebî, zanîna beyan, me´anî û honraweyê de serwext bûye. Ji bilî Keşşaf û Mufesselê berhemên wî yên el-Minhac fî i-`Usûl, Rebî´ el-Ebrar, Dallet en-Naşid û el-Faîq fî Xerîb el-Hedîs jî navdar in.